



Informationsverbund
ASYL & MIGRATION

Die Anhörung im Asylverfahren – Hinweise für Asylsuchende in Deutschland

Sprache: Kurdisch (Kurmandschi)

Îfadeya di dema xwestina mafê penaberiye de

Pêşniyar ji bo penaberên li Almanya

Çapa yekem 2009

Dieses Merkblatt haben Sie erhalten von:




In Kooperation mit



Îfadeya di dema xwestina mafê penaberiye de

Pêşniyar ji bo penaberên li Almanyayê




Ev broşûr (pirtûk) rêya îfadeya te ya ji bo mafê penaberiye ronahî dike û şîretan li te dike. Lêpîrsînkirina te derfeta herî mezin e ji bo ku tu karibî sedemên reva xwe bînî ziman. Li ser bîngeha îfadeya we, wê „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (**Bundesamt für Migration und Flüchtlinge – BAMF**) biryar bide ka hûnê li Almanyayê werin qebûl kirin. Pêwîste tu xwe baş ji bo vê îfadeyê amade bikî.

Berî îfadeya xwe bi parêzgerê (Avûqat) bişewire, an ji serî li bîroyeke şewirdariyê ya karê penaberan bide. Li Almanyayê çend rêxistinên ne fermî yên ne girêdayîyê dewletê hene yên ku bê pere alîkariya kesên daxwaza mafê penaberiye dikin hene. Ev biro li her bajarê mezin û li cihê pêşwazîkirina penaberan dikin hene.




Serlêdana ji bo daxwaza mafê penaberiyê

Tu dikarî mafê penaberiyê li „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) bixwazî. Eger tu daxwaza penaberiyê ji daireya polisan an jî daireya biyaniyan, an deverên din yên fermî bixwazî, wê dîsa te bişînin cem „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“. Eger tu neçî wêderê ev yek wê zerarê bide doza te ya penaberiyê.



„Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) wê pirsên taybet li ser kesayetiya te bikin, wê wênayê (foto) te bigrin û wê ji tiliya te mînakê bigrin. Her weha bi giştî wê li dor 25 pirsan li ser kesayetiya te, li ser bav û dayik, bapîr û dapîr, welatê te û ciyê te yê dawî, yê ku tu lê mabûyî were pirsîn. Her weha wê ji te were pirsîn ka tu di kîjan rêyê de hatî Almanya. Hemû pirs û bersivên te wê di dosyakê de kom bikin û ji bo lêpîrsîneke din, wê gotinên te bidin ber hev û sût ji agahiyên te wergirin.



Wê nasnameyekê (**Aufenthaltsgestattung**) bidin te. Ev nasname pêwîste hertim bi te re be. Tê de hatiye nivîsandin, ka li kîjan herêmê tu dikarî serbest bigerî.

Eger te şandin ciyekî din, yê ku tu lê bimînî, pêwîste tu ciyê xwe yê nû ji „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) re yekser û bi lez bibêjî. Yan jî parêzgerê xwe agahdar bikî. Pêwîste ku di her demê de parêzgerê te yan jî biroyeke şewirdariyê haya wan ji ciyê te hebe.

Pêwîste têkiliyên te bi balyozxaneyê welatê te re tune bin. Eger rayedarên fermî yên Elman ji te bixwazin ku tu passport an wereqeyên din peyda bikî, çênabe tu biçî balyozxaneyê welatê xwe. Eger rayedarên Elman zorê li te bikin, vê yekê zû bigihîne parêzgerê xwe.

Ki dikare mafê penaberiye bixwaze?

„Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) wê li rewşa te û koçberiya te ji welatê te vekolîne û wê li zordariya li ser kesayetiya te pirsyariyê bike, ka çi zor û metirsî li ser azadiya te heye, ji zora siyasî, netewî, olî an jî ji zorên din yê li miroven tên kirin.

Dibe ku zordarî ji hêla saziyên dewletê ve li te hatibe kirin. Dibe ku zordarî ji hêla saziyên ne fermî, ango ne yê dewletê li te hatibe kirin. Mînak dibe ku tu ji hêla partiyek, grupeke çekdar, civateke olî, ji hêla gundekî an jî mirovên malbatekê an jî ji hin kesan ve zor li te hatibe kirin. Di vir de wê were vekolîn, ka tu ji hêla dewletê an jî polîsên wê dewletê ve, hatî parastin an na?

Wekî din „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt), dide ber çav, ka di vegera welatê xwe de, tu yê rastî xeterî û nexweşiyên giran yê fîzîkî, jiyan û azadiyê werî an na.

Dîsa tê lêkolîn kirin, ka tu dikarî li herêmeke din ya welatê tu jê reviyayî bijî an na? Eger tu bikarî li herêmeke din ya welatê xwe bijî, tu wê mafê penaberiye nestînî.

Gelek dewletên Ewrûpa, weke Almanya jî li hev kirine, ku mafê penaberiye tenê li yek welatê Ewrûpa were pêk anîn. Eger hûn bi vîsekê ji welatekî Ewrûpa hatibin, an jî we li wir dawa mafê penaberiye kiribe û li wir hatibin naskirin. Berî her tiştî pêwîste tu agahî ji saziyên şewirdariyê an jî ji awukatên xwe bigrî, ka kî berpirsyare ji bo penaberiye. Herwiha ka tu dixwazî li Almanya bimînî an li devereke din mafê xwe yê penaberiye bistînî.

Lêpirsîna li „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt)

Îfadeya te wê ji hêla memurekî (xebatkarekî) „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) ve were girtin. Ev memûr wê biryara bidestxistina mafê te yê penaberiye bide. Eger te berî niha agahiyên xwe dabin polîs û deverên din, ew ne gelekî muhîm in. Ji ber ku ya biryarê bide „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) e.

Di nav çend rojan de, wê lêpirsîn û guhdar kirina te were kirin. „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) wê bi niviskî, ji bo guhdarkirinê dawet bike (**Anhörung gemäß § 25 Asylverfahrensgesetz**). Eger hûn nizanin, ka kengî lêpirsîna we wê were kirin, pirsyariyê ji biroya şewirdariya an ji awukatê xwe bikin. Eger ji ber sedemeke nexweşînê hûn nikarin biçin îfadeyê, bi lezgînî „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) agahdar bikin û wereqa doxtor bidin wan.


Guhdarîkirin û lêpirsîna we firseta herî girîng e, ku hûn sedemên penaberiya xwe destnîşan bikin. Berî guhdarîkirinê hemû tiştên ku hun dixwazin bibêjin bînin bîra xwe. Hûn dikarin tiştên hûn bixwazin bibêjin, ji xwe re binivîsin û wisa zelaliyekê di serê xwe de çêkin. Lê belê nivîsên xwe nedin wan û bi xwe re nebin ciyê lêpirsînê. Pêwîste hûn li ser tiştên ku hûn pê biêşin an jî aciz bibin agahiyan bidin.



Wek jin an mêr, hûn nikaribin li ser hin tiştan biaxivin, bi lezgînî „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) agahdar bikin. Di vê rewşê de, wê xebatkarên taybet ji bo we amade bikin. Herweha eger problemên we yên nefsi hebin, xebatkarên taybet dikarin ji we baş fahm bikin.



Dibe ku, hun bixwazin mirovekî baweriyê ji bi xwe re bibin lêpirsînê. Ji bo vê jî dîsa pêwiste hûn zû agahdariyê bidin „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt). Ew kesê hûn bixwazin bi were bê lêpirsînê, mecbûre Almanî zanibe. Ev kesê bi were, nikare li ser hatine we biaxive.



Di wextê lêpirsînê de, werger (tercuman) wê amade bibe. Zû agahdariyê li ser zimanê ku hûn dixwazin werin lêpirsîn kirin bidin, li gor vê yekê wê tercumanekî ji were peyda bikin.

Di wextê xwe de biçin ciyê lêpirsînê. Eger belge, ango dokumentên derheqê derketina ji zindanê de, an nivîsên rojnameyan, ku karibin rewşa we îspat bikin, wana di wextê guhdarîkirinê de teslîmî wan bikin. Eger hun bêjin mirovên we, yan hevalên we dikarin dokumentên girîng ji were peyda bikin, vî tiştî jî ji wan re bibêjin. Tu caran, dokumentên sexte, ne rast nedin destên wan. Ev yek wê bandoreke xirab ji bo penaberiya we çê bike.

Werger (tercuman) mecbure, hemû agahiyên we rast bibêje. Karê werger tenê ewe, hemû tiştên hûn jêre bibêjin wergerîne ango ji „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) re bibêje. Eger hûn bikevin şikê, ku werger (tercuman) karê xwe baş nizane, xebatkara agahdar bikin. Û eger werger qet baş nizane wergerîne, kesekî din bixwazin. Bila hemû gotinên we werin nivîsandin.



Lêpirsîn bi giştî ji 25 pirsan pêk tê. Ev pirs li ser nasname, ango nav, zewac, zarok, dê û bav, dapîr û bapîr, navnîşan (adress), sinat (meslek) û li ser rêya hatina we ye. Eger berî niha we ev agahî dabîn, wê tenê li ser hin tiştên girîng careke din pirsan bikin. Di hemû deman de, bersiva xwe li piştî ku we pirs guhdarî û fahm kir, bidin. Eger we pirsê fahm nekir, dubarekirina wê bixwazin. Hemû gotinên we pêwîste li hev derkevin û nebin cîyê şikê.

Eger hûn ne li ser rêya erdî hatibin, pêwîste hûn bi berfirehî agahdariya hatina xwe bidin. Bi taybetî ev yek ji bo hatina we ya Almanya bi rêya firokê/esmanî. Eger bilêt/ticketê we hebin, wana bidine wan.

Piştî careke din hûn dikarin bi berfirehî li ser hatina xwe agahiyan bidin. Mînak li ser girtin, lêdan û tiştên din, yên bûne sedemên reva we. Eger hûn karibin bi berfirehî agahiyên li ser reva xwe bidin, wê baweriyê bêtir ji bo xebatkaran çê bibe. Sedemên, ku hûn nikarin vegezin welatê xwe û tirsî we ji vegeerê bibêjin. Eger pirsî rewşa siyasî ya welatê we neyê pirsîn, gotinên siyasî li ser welatê xwe nebêjin.


Sedemên hatina xwe bi rastî bibêjin û „çîrokên“ ku hin penaberên din di lêpîrsînê de nebêjin, ji ber xebatkar zû derdixin, ka mirov çîrokekê dibêje an jî rastiyê.

Eger nexweşîneke we hebe ji bo „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) re bibêjin. Bi taybetî eger hûn ji welatekî ku binezasiya tenduristiyê lê qels e an jî dermankirina nexweşîna we gelekî biha be.

Dibe ku xebatkarên „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) di hin xalan de pîrsan dubare bikin. Careke din hewcedariya we bi bersivdayîna berfireh heye. Leza bersivdayîna pîrsan tune ye. Wekî din hûn dikarin daxwaza berdewama lêpîrsînê ji bo rojêke din bixwazin.

Hemû gotinên we yên lêpîrsîna têne tomar kirin û piştê jî têne nivîsandin.

Protokola lêpîrsînê mecbûre hemû gotinên we, yek bi yek tomar bike. Ango eger hûn di wê baweriyê dene, ku hemû gotinên we nehatine tomar kirin, hûn dikarin daxwaza sererastkirinê bikin.



Di dawî de jî hûnê îmza (destnîşan) xwe bidin, li ser ku we hemû tişt fahm kirine û bi firehî derfetên bersivandinê ji were hatine veqetandin. Eger hûn bi hemû tiştên nivîsî razî ne, hûnê îmza xwe bavêjin bin nivîsê. Eger hûn ji nivîsa hatiye amadekirin ne razî ne, bi lezgînî agahî bidin ciyê şêwirdariyê an jî awukatê xwe.

Daxwaza kopyeke bixwazin û bidin awukatê xwe. Careke din nivîsa lêpîrsînê bixwînin û tiştên ne rast ji bo awukatê xwe bibêjin. Eger awukatê we tunebe, alîkariyê ji ciyê şêwirdariyê bixwazin.

Biryara „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt)

„Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) wê biryara xwe bi niviskî ragihînin we. Ji ber wê, pêwîste hûn hemû rojan li posta xwe binêrin û pirsra posta xwe bikin.

Eger awukatê we hebe, „Daireya Karûbarên biyanî û Penaberan“ (Bundesamt) hemû nameyên we bişîne ba wî. Hemû deman têkiliya we bila bi awukatê were hebe.



Eger mafê penaberiyê hate redkirin, mafê we heye hûn li ber rabin. Eger redkirina we ji ber „sedemên nediyar“ (**offensichtlich unbegründet**) were diyarkirin, hûn mecbur in, di navbera heftiyekê de li ber biryarê rabin, di biryarên din de du hefte wextê we heye. Ji ber vê, eger biryar kete destê we, bi lezgîni awukat an jî ciyê şêwirdariyê agahdar bikin.

Eger serlêdana we ya penaberiyê weke nepejirandî (**unzulässig**) were redkirin, tê wê maneyê, ku naveroka serlêdana we ji bo penaberiyê nehatiye vekolîn. Her weha dibe ku, mafê penaberiya we neyê berçavkirin, an jî redkirin, ji ber ku we beriya niha li welatekî din yê Ewrûpa dawa mafê penaberiyê kiriye. Ji ber wê dibe ku we bişînin wî welatê ku we cara pêşîn daxwaza penaberiyê kiribe. Dîsa ji bo vê yekê biçin ciyê şêwirdariyê.



Impressum

Herausgeber: Informationsverbund Asyl und Migration e.V., Greifswalder Str. 4, 10405 Berlin, kontakt@asyl.net, www.asyl.net

V.i.S.d.P.: Michael Kalkmann, c/o Informationsverbund Asyl und Migration

Erstellt in Zusammenarbeit mit Info-Bus für Flüchtlinge München.

© 2009 Informationsverbund Asyl und Migration • Unveränderte und vollständige Vervielfältigung und Weitergabe ist gestattet.